Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1208 | 29-Îlon-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Serabî, 20 salin hemû astengiyên di navbera xwe û hunerê de rakiriye



Navenda Nûçeyan

**Tevî ku xwedî pêdawîstiyên taybete jî, lê 20 salin di maleke biçûk de karê wênesazî û şêwekariyê, her wiha 12 salin bi karê mûzîkê ve mijûl dibe. Li gel pêşxistina hunera xwe, bi vê rêyê debara jiyana xwe jî dabîn dike.**

Omer Ebdula Ezîzî bi nasnav Omer Serabî xwedî pêdawîstiyên taybete ku li taxa Kareba ya li bajarokê Qeladizê ya îdareya Raperîn jiyan dike. Omer Serabî di sala 1971'an de li vî bajarokî jidayîkbûye û heta niha jî li vir jiyana xwe didomîne. Dema li bajarê Stenbol yê Tirkiyeyê kar dikir, di encama lêketina hesin de pişta wî dişke û her du lingên xwe winda dike.

Serabî piştî ku lingên xwe winda dike û vedigere Kurdistanê û li pey du hobiyên xwe yên zarokatiyê digere. Wek bi xwe dibêje bi rêya internêtê xwe fêrî xêzkirina wênesazî û lêxistina bilûrê dike.

Ew bi tena serê xwe di odeyeke tije huner û jêhatî de dijî. Kêmbûna lingên wî li pêşiya pêşxistina hunera wî nebûn asteng, berovajî vê yekê behremendiyên gelek bedew pêş xistiye.

Gava ku hûn dikevin hundurê malê, çavên we bi wêneyên ku berhema keda salanin dikeve. Her wiha hebûna amûrên mûzîkê bala we dikişîne ku dengê def û bilûrê odeyê tejî dike. Omer Ebdula Ezîz ango Omer Serabî di derbarê çawaniya destpêkirina vî karî got: "Di salên 80'yî de min dest bi karê hunerê kir ku ez wê çaxê xwendekar bûm. Ji ber temenê biçûk, min nekarî karê xwe vegerînim pîşeyî."

Serabî piştî lingên xwe di qezayekê de ji dest dide, mala xwe vedigerîne cihekê gelêrî û biryar dide ku di nava hunerê de jiyan bike û hunerê bike beşek giring ji jiyana xwe. Tabloyên ku Serabî xêz dike, xelk ji nêz ve bi baldarî nêz dibin. Ev yek jî hîn zêdetir Serabî teşwîqî hunerê dike û hunera xwe vedigerîne pîşeyekê ku bi wê debara jiyana xwe dike.

Omer Serabî wiha dibêje: "Ji bilî şêwekariyê, bi her tiştê ku jê re huner tê gotin bi taybetî jî bi muzîkê re eleqedar bûm. Nêzî 20 salin bi karê wênesazî û şêwekariyê ve, her wiha nêzîkî 12 salane jî bi karê muzîkê ve mijûl dibim. Ti wextê min yê vala nîne, ji ber ku bi rastî jî min ji demê vale ziyanê dîtiye. Ji ber ku Qeladizê dûr bû, kesek tune bû ku alîkariya min bike. Ji bo wê min serî li torên medya dijîtal da û pirtûk û çavkaniyên din peyda kir. Niha ji bilî karê wênesaziyê, ez bi berdewamî karê mûzîkê jî dikim."

Di dewama axaftina xwe de Serabî balkişand li ser amûra mûzîka bilûrê û wiha axivî: "Bilûr amêrek hewayê ye û hestiyare. Di nava bilûrê de valehiye, ji bo wê hunera te di wê deye ku tu bikarî pifbikî û bikarî deng jê derbixînî. Derxistina dengek hunerî ji qamîşek ku nava wê vale, hinek zehmete. Salek heta du salan divê pê ve mijûl dibî heta dengê wê safî dibe."

Hunermend Omer Serabî bang li hikûmetê kir ku zêdetir girîngiyê bide hunerê, ji ber ku di çanda Kurdî de hunereke pir xweş û berfireh di hemû waran de heye. Omer Serabî her wiha peyamek ji kesên xwedî pêdawîstiyên taybet û kesên din re jî ragihand û got: "Ger di dil û mejiyê wan de jêhatîbûn an hunerek hebe, ew dikarin pêşbixin. Li şûna ku hizra êşa xwe û derdora xwe bikin, xwe û derdora xwe nerehet bikin, bi amêrek mûzîkê yan jî curek yê hunerê ve xwe mijûl bikin. Hem dem derbas dibe, hem jî ruh û deruniyê aram dike."

# Evîndarê Kurdistan im

Cîger Dilşad



Min xwest ji nav refê peyvên rengorengo
Siwarbim li baskên peyveke pîroz
Û bifirim ezmanê welatê rojê
Da ku bireqisîn im zarokê hundirê xwe
Bi çivîk û stêrkan re
Lê dizên wateyê û heqîqetê
Ji zû ve peritandibûn rastiya hemû peyvan
Herikandibûn xwîna wan a kesk
Bê adanî mabûn
Ew êdî tenê peyvekê xwe melisandibû li ber dîwêr
Dîwarekî ji hevketî û dike hawar
Bêhna dîrokê û evînên nîvco hatine hiştin, jê difûrî!
Nizanim
Ew dîwarê ziyaretgeha feqiyê teyran bû
An yê Ehmedê Xan ê bû
Belkî dîwarê dibistana sor û gora Melayê Cizîrî bû ew
Dibe ku dîwarê birca belek, an gora Mem û Zîn be.

Belkî dîwarê ku bûye şahîdê darvekirina Şêx Saîd û seyid riza
An jî şemitandina kursiyê ji bin lingê lawan li ber çavê bavan be!
Belkî dîwarê ku şahîdî ji agirê newroza Mazlûman re kiribe
An ji çar lawên agir û rojê re
Dibe ku ji helandina gewdeya Xeyrî, Kemal, Akîf û Elî'yan re
Na, bi gumaneke mezin ew dîwarê ku
Egîd'an li ser nivîsîbû " bijî kurdistan'a azad!"
Lê şehitandina kevirên wî raber dikir ku
Ew dîwarê dojeha îmralî ye
Ya ku ji berxwedan û sebra kurê uveyşê re bûye şahîd
Erê, tenê peyvek mabû li ber dîwarekî şehitî!
Peyvek diperpitî di bin siha dîwêr de
Evîndarê Kurdistan im!
Min dîtibû ew peyva baskên wê
Mîna baskê kenê zarokên welatê min şikestîbûn
Ji wê rojê ve
Ez bûm cebirkerê baskên şikestî
Û dicebirîn im baskên peyva xwe
Evîndarê Kurdistan im…

Sudoku: Bersiv 7

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 1 | 6 | 3 | 4 | 8 | 9 | 5 | 7 |
| 5 | 4 | 8 | 7 | 9 | 6 | 2 | 1 | 3 |
| 3 | 7 | 9 | 5 | 2 | 1 | 6 | 4 | 8 |
| 7 | 9 | 5 | 2 | 6 | 4 | 8 | 3 | 1 |
| 6 | 8 | 1 | 9 | 3 | 7 | 5 | 2 | 4 |
| 4 | 2 | 3 | 8 | 1 | 5 | 7 | 9 | 6 |
| 1 | 6 | 2 | 4 | 8 | 9 | 3 | 7 | 5 |
| 9 | 5 | 4 | 6 | 7 | 3 | 1 | 8 | 2 |
| 8 | 3 | 7 | 1 | 5 | 2 | 4 | 6 | 9 |

Sudoku:Pirs 8

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | | 4 | | 1 | 2 | | 6 | |
| | | 5 | 6 | | 8 | | | 3 |
| | | | 5 | | | 8 | | 1 |
| 9 | | | 4 | | | | | 7 |
| | | | | 9 | | | | |
| 7 | | | | | 6 | | | 8 |
| 6 | | 9 | | | 3 | | | |
| 4 | | | 9 | | 1 | 5 | | |
| | 1 | | 8 | 6 | | 2 | | 9 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ba ji te bager ji te:**
- Bi heman wateyê.

**Ba ji te baran ji te:**
- Bi heman wateyê.

**Gayê cot e, lê cot nake:**
- Ji bo wî karî hatiye erkdarkirin, lê nake.

**Giya li ber gur e, goşt li ber berxê ye:**
- Dema tiştên ters tên kirin hingê tê gotin.

**Gotin gotinên Mûsa ne, kirin kirinên Firewn in:**
- Gotinên wî yên pêxemberan in, lê kirinên wî yên zordestan in.

**Gul e bi şîlanê ve hatiye:**
- Ew bixwe pir baş e, lê malbata wî (yan jî derdora wî) nebaş e.

**Gula di nava diriyan de ye:**
- Bi heman wateyê.

**Hem li nalê dixe hem li bizmarê:**
- Durûtiyê dike; dualî diaxive; axaftinên wî hev nagirin.

**Hûr biajo kûr biajo û bila ga jî newestin:**
- Dema yek tiştên ne berbiaqil dibêje hingê tê gotin.

**Ji bara hev ketin:**
- Êdî nikarin hevaltiyê bi hev re bikin; hevaltiya wan xirab bû.

**Ji hev dûr ketin:**
- Navbera wan xirab bû; ji hev xeyidîn; têkiliyên xwe ji hev birîn; navbera wan ne xweş bû; ji hevaltiya hev ketin.

**Ji hev nagirin:**
- Di navbera wan de nakokî hene; ne weke hev in.

Li nalê jî dide; li bizmarê jî;
- Durûtiyê dike; dualî diaxive; axaftinên wî hev nagirin.

**Li ser çokên wî rûdine, riha wî dikişkişîne:**
- Bi xêra wî, bi alîkariya wî xwe bi rê ve dibe û dijberiya wî dike.

**Li ser çoka wî rûdine simbêlên wî dikişkişîne:**
- Bi heman wateyê.

Ma aliyekî cendek helal yek heram e?
- Eger xirab be tev xirab e
Navbera min û kîjan cîranên min xirab bibe, jina min diçe li ber derê mala wan teşiya xwe dirêse.
- Ez ji kê hes nakim ew xwe nêzî wan dike; ka ez ji çi dixeyidim wê dike.

**Pîrê tir kir pîr xeyidî:**
- Ji her tiştî dixeyide; hem sûc dike, hem dixeyide.


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Jinên Efrînê li dijî dagirkeriyê serî hildan




Li dijî sûcên ku di derheqê jinan li Gundê Kaxrê yê Efrînê di 15'ê Îlonê de hatiye kirin, jinên Efrînê li Kantona Efrîn û Şehbayê teqez kirin ku ew ê ji hawara jinên Efrînê re bibin hêz.**R-2**

## Encama Komploya 9'ê Cotmehê



Di 9'ê Cotmeha 1998'an de Komployeke Navneteweyî li dijî Rêber Apo dest pê kir. Ev Komplo di şexsê Rêber Apo de li dijî Kurdan, li dijî Kurdistanê û Rojhilata Navîn bû. **R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1208 | 29-Îlon-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# XETA SÊYEMÎN RÊYA AZADIYA GELAN E

Xeta sêyemîn ne projeyeke demkî ye. Xeteke siyasî û stratejîk e. Di vê stratejiyê de rola herî girîng dikeve li ser milê gel û civakê. Rêber Apo tîne ziman ku Rojhilata Navîn di nava agir de ye û çareseriya wê jî xwe dispêre hêza gelan û têkoşîna wan a xeta sêyemîn. Li ser wê bingehê rêxistinkirin û perwerdekirina gelan wê zemînê têkoşîna hevpar ava bike û destê neyaran ji Rojhilata Navîn qut bike.**R-5**



## Silêman Ehmed 341 rojin ji aliyê PDK'ê ve hatiye girtin



Rojnamevan Silêman Ehmed 341 rojin ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin. Rojnamevan Silêman piştî 279 rojan hate dadgehkirin û PDK'ê 3 sal cezayê girtîgehê lê birîn.**R-3**

## Avakirina bajarê pêşesaziyê projeyeke stratîjîk e



Şaredariya Gel a Amûdê di 23'ê Adara 2024'an de, dest bi projeya avakirina bajarê pêşesaziyê li bajarê Amûdê kir. Her wiha di vê projeyê de 200 dikan hene û li kêleka wê stasyoneke sotemeniyê jî tê avakirin.**R-6**

## 'Rewşenbîrên kurd xwedî mîras û ezmûnên giranbiha ne'




Rewşenbîr Zerdeştê Kal diyar kir ku berhemên ku rewşenbîr li Ewropayê diafirînin ew jî ne kêmî yên ku li welatên din tên afrandin, lê belê astengî pir in. Zerdeştê Kal da zanîn ku armanca rewşenbîr, nivîskar û wêjevanên kurd ya sereke ew e ku di riya nivîs, stranbêjî, şano û şêwekariyê re, bibin mîna vedengekê ji welatê xwe re.**R-7**



**Erdogan Li NY xweliyê direşîne sûcên xwe û Îsraîlê rewa dike!**
Idrîs Henan *R-5*

# Jinên Efrînê li dijî dagirkeriyê serî hildan

Li dijî sûcên ku di derheqê jinan li Gundê Kaxrê yê Efrînê di 15'ê Îlonê de hatiye kirin, jinên Efrînê li Kantona Efrîn û Şehbayê tekez kirin ku ew ê ji hawara jinên Efrînê re bibin hêz.

**Zana Roj/ Şehba**

Di Efrîna dagirkirî de sûcên qirkirinê di bin bêdengiya navnetewî û mirovî de têne kirin. li ser kiryarên qirkirina xwezayî û mirovî yên ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan ve tên kirin; nêzî 7 sala ye derbas dibin. Herî dawî ji aliyê komên Çeteyên ku li gundê Kaxrê ya navçeya Mabata ya Efrînê dimînin di 15 ê Îlonê de destdirêjî li jinên gund yên ku nerazîbûna xwe li hember ferizkirina baceyan li ser wan dane raberkirin de kirin. Ev yek bi sala ye bi vî awayî tê berdewamkirin bi tayvbet bi nêzîkbûna demsala rakirina zeytûnan de komên çeteyan bi zagon û fermanên nû û kiraptir hewla destdanîna li ser berhemên gel bikin yan jî baceyên giran li ser wan feriz kirin. Di encama vê destdirêjiyê de bi dehan ji jinên Kurd lêdan xwarin û birîndar bûn. Bê guman ev bûyera di nava cîhanê de dengvedaneke mezin avakir û bang li raya giştî hate kirin ku rê li pêşiya qirkirina gel û kiryarên dagirkeiryê di Efrînê de bigrin.

Koçberên Efrînê û gelê Gundê Kaxrê bi taybet yên ku li herêma Şehbayê dimînin li hember van cûcan daketin qadan û bi heman armancê kiryarên dagirkeiryê şermezar kirin. têkildarî sûc û kiryarên dakirkeriyê jinên Efrînê yên bi navê Ebyet Şewket Elî û Birîvan Elî ji rojnameya me re axivîn.

**`Bi zihniyeta ku li ser tunekirina jinê hatiye avakirin, destdirêjî li jinê hate kirin`**

Ebyet Şewket yek ji hemwelatiyên gundê Kaxrê ye anî ziman ku bûyera li dijî jinên Kaxrê hatiye kirin bûyereke dijî îradeya jinê ye û wiha got: "Bi armanca pelçiqandina îradeya gelê Kurdê di Efrînê de, zêdetirî 6 sala ye komên çeteyan destdirêjiyê li ser jinên Kurd dikin. di bin zextê de devê gelê Kurd hatiye girtin û ji tirsa çeteyan re gel bê çare dimîne û banga mafê xwe nake. Komên çeteyan û bi taybet ya Emşata dest danîne ser hemû milkên me, berhemên zeytûnan ji xwe re dibin û mirovên me li wir jî nikarin xwedî li milkê me derkevin. Komên çeteyan bi darê zorê ji miletê gund pere û baceyan dixwazin. Di vê bûyera dawiyê de ya li hêrsa jin û gelê gund derxistiye holê tê dîtin ku bêdengiya li hember sûç û neheqiya ku tê kirin gihiştiye kîjan astê. Milet li hember van kiryaran êdî nikare bêdeng bimîne, ji lewra jinên gund derketin qada. Zihniyeta komên çeteyan ya li ser esasê tunekirina jinê hatiye avakirin, di destdirêjî û lêdana bi dehan ji jinên temen mezin hate derketin. ev yek nîşan dide ku bûyera ku hatiye rûdan di asta yekemîn de li dijî têkbirin û tepisandina deng û îradeya jina Kurd e".

**`Ger îro jinên Efrînê derketin, wê sibê gel tavahî be"**

Her wiha Ebyet di berdewamiya axaftina xwe de ev diyar kir: "Bila jinên Kurd di Efrînê de nebêjin ku ew bi tenê ne û wê dengê wan negihîne tu cihî. Ne bi zext, lêdan, tecawîzkirin û dorpêçkirina gundan, tu carî wê rastiya ku di Efrînê de tê jiyan kirin neyê veşartin. Ger îro li gundê Kaxrê jinan nerazîbûna xwe nîşan dan ev tê wê wateyê ku wê di rojên pêş de qêrîna gelê Efrînê li hember hovîtiya tê kirin bê derketin. em hemû li hember jinên Efrînê berpirisyarin, û emê ji hawara jinên Efrînê re bibin hêz û xwedî lê derkevin".


Ebyet Şewket Elî


Birîvan Elî

**Şerme ji bêdengiya navnetewî re**

Jina bi navê Birîvan Elî bal kişand ser bêdengiya navnetewî û wiha pê de çû: "Di dirêjahiya 7 salan de li dijî kiryarên dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan di Efrînê de û bi taybet kiryar û sûcên ku derheqê jina Kurd de hatine û tên kirin de, raya giştî û tavahî rêxistinên jin yên navnetewî ker û lal mane. Hemû bê heqiya ku di wir de tê kirin hatine belgekirin û bi milyonan ji gelê Kurd û jinên azadîxwaz daketin qadan û banga bidawîanîna van sûcan kirin. Her çendî bang li tevger, rêxistin û raya giştî hatiye kirin ku destwerdanê li herêma Efrînê bikin û rewşa gel ji nêz ve bişopînin, lê ev yek bê encamp maye. Gelo armanc ji vê bêdengiyê çi ye? rawe kirina dagirkeriyê û qirkirina etnîkî ye!

Em bang li rêxistin û aliyên têkildar dikin ku êdî şerme ji bêdengiya we re, xwedî li erk û berpirsyartiyên xwe li hember mirovahiyê derkevin. Baweriya me bi hebûn û îradeya gelê Kurd heye ku wê muheqeq vegera li Efrînê û bidawîkirina dagirkeriyê wê nêz be".

# Zilamê serwer jin û malbat di nava pencê xwe de tepisandiye...(1)

**Leyla Waşûkanî**

Hişmendiya mêrê serwer pergala, xwe di her qelîştokekê jiyanê de veşartiye û îro jî xwe di hişê her ferdekî civakê de bi cih kiriye. Di serî de mêr û paşî jin, zarok û her, wiha nifş bi nifş wê çandê ji hevdû fêr dibin û jiyana xwe wiha berdewam dikin. Zarokê kur ji bavê xwe fêr dibe û zaroka keç jî, ji dayika xwe fêr dibe û karîkatoriya, jin- mêr wiha berdewam, dibe. Bi demê re civak jî wê çanda serdestiyê ji xwe re, wek qederekê dibînin û dişopîne. Di serî de mêr xwe, wek pergal, serwer dike û paşî, jin û civak jî bi wê nexweşiyê, bandor dibin. Ew pirsgirêka hişmendî, bi demê re pileya xwe bilind dibe û digihêje pileya kaosê û ferdcivak di nava wê kaosê de têne tepisandin û dikevin rewşeke pir xerab ku şêşwaz dimînin. Ferdê ku hatiye çewisandin û bûye koleyê moderin, wiha lê hatiye ku nikare li ser lingê xwe raweste. Ji xwe ji guherîn û veguerînê, bawer jî nake û koletiyê, qedera xwe dibîne. Ferdê ku serî hatiye tewandin, vîna xwe jî şikestiye û gihaştiye rewşeke, miriyê li ser lingan ê jar û perîşan. Ew ferd ji xwe bêbawer dibe û gazincan dike, di heman demê de zeka û insyatîfa xwe jî lawaz dibe û bi demê re taybetmendiyê xwe yê aktîfbûnê wenda dike. Ew ferdê bê çare koletiyê, qedera xwe dibîne û pê jî razî dibe, bê ferq û cûdahî, çi jin be yan jî mêr be, ger ku mirov ji hêla fîzîkî de kolebe, bi fikir û ramanê xwe, dikare, xwe rizgar bike, lê ger ku mirov ji hêla vîn û mejî de, kolebe pir zehmete ku mirov were rizgar kirin. Wek tê zanîn civaka, kurd ji hemû hêlên xwe ve hatiye kole kirin û ev jî dibe sedem ku ji xwe bê bawer be û yê ku ji xwe bê, bawer be teqeze ku wê ji hemû cîhanê jî bê bawer bibe. Tişta herî zehmet jî ewe ku mirov ji her tiştî bê bawer bibe, ne xasim jî ku ji xwe bê bawer bibe. Xeleka yekem ya pergala civakê, malbat bi xwe ye û dema ku ez li ser mijara malbatê lêkolîn dikim, matmayî dimînin. Sedema xwe jî ewe ku pergalê, destdirêjî saziya malbatê kiriye û ji xwe re kiriye perestgeha dewletê. Pergala mêrê serwer, di nava malbatê de şaneyên xwe yên mêrane çêkirine û malbat kirine dewleta biçûk.

Malbat di rewşeke pir zor û zehmet de dijî

Dewlet ferdê nêr ê mezinê malê dike sîxurê xwe û li ser jin, dayik û zarokê malê, dike hukumdar. Çawa dewlet desthilatdariya xwe li ser civakê ferz dike, bi heman rengî mêr jî li ser jin û malbatê hukmê xwe ferz dike. Careke din rola ferdan dubare dibe, zarokê kur teqlîda bavê xwe dike û dibe serwer, zaroka keç jî teqlîda diya xwe dike û dibe, koleyek ser û pişt xwar. Dema ku em li ser zanista civakê lêkolîn dikin, em dibînin ku hîna jî civak û ferd baş nehatine tehîlkirin û zanyarên, heyî yên pergalê jî nebes mane û pirî caran jî bûne sedem ku pergal, mijokdariya xwe li ser civakê hîn xurtir bikin. Pergala xwedî hişmendiya zayendperest hemû zanist xistine bin baskên xwe û ji wan sûd wergirtiye. Dema ku em dixwazin, lêkolînekê li ser jin û malbatê bikin, em dibînin ku di rewşeke pir, zor û zehmet de dijîn. Pergala baviksalar xwe, di her damarên jiyanê de bi cih kiriye û rêbazên xwe yên tund û tujiyê bi rengekî pergalîk li ser jin, malbat, civak û xwezayê bi kar aniye. Di serdema pergala sermayedar de pileya xwe kuştina, jin û ciwanan pir bilind bûye, ji xwe bê exlaqî û dest dirêjiya li ser jin û zarokan pir zêde bûye. Ji xwe xweza hilweşîneke, mezin jiyan dike û ew jî bertekên xwe li himberî bê wijdaniya mirovan, raber dike. Bi qasî ku xweza ji mirov re, dayike û hebûne, her wiha di encama bê pîvaniya mirovan de werdigere felaket û tofanan, mîna tofana Nûh Pêxember ku ew jî bi sedema ferdperestiya, mirovan û hişmendiya wan a desthilatdar û talanê. Mezinên me hevokek wan, ya wiha heye: Dibêjin ku mirov çi biçîne, wê heman tiştî jî berhev bike. Rêber Apo di vê mijarê de, wiha dinirxîne û dibêje, hemû zindî li pey azadiyê ne, xweza bi xwe jî li pey azadiyê ye û li himberî nêzîkatiyên mirovan ên texrîbkar, bertekê xwe raber dike. Emê di vê derbarê de çend nimûneyan jî bidin diyar kirin, bi rastî erdhejên ku di salên dawiyê de çêdibin, wiha xweber nînin. Ji xwe baranên di demsala havînê de û wergerîna wê ya lehiyan, bi serê xwe ne xwezayî ne. Ev bûyer hemû ders û îbretin ku xweza bi me dide, nîşandan ji bo ku em ferdperestiya xwe ya reş bibînin. Gerek civak û ferdê xwe li himberî van rewşan şiyar bin û tekoşîna wan ji bo parastina Ekolojiyê be. Ger ku em xwe têxin, şûna xwezayê û bihizirin, em ê ji mirovbûna xwe nifretê bikin, xwezaya ku me di himêza xwe de xwedî dike û ji me re mesken û baregehe, lê dema ku em li nêzîkatiyên, xwe yên ji xwezayê re temaşe dikin em ji berxweve şerm dikin, bi taybet nêzîkatiyên pergala mêrê ferdperest û sûdmend. Mêrê ferdperest û desthilat ê xwedî hişmendiya talancî û şerker ku ewqasî çek pêşxistine û gihandine pileya çekê Nûkler (Kîmyawî) ji bo ku hakimiyeta xwe li ser cîhanê çêbike. Tevî hemû karesat û xerabkariya, berhema hişmendiya mêrpereste, lê cardin jî pergal bi sînor nabe û dest ji desthilatdariya xwe bernade û hewldana xwe, ewe ku bibe serdarê cêhanê. Pergala ku bi sedema hişmendiya xwe ya hukumdar, xweza talan kiriye di serî de bi riya komplo jinê zeft dike û paşê di şexsê jinê de civakê kole dike û paşê beleya xwe ya reş li xwezayê dide. Mêrê serwer bi rêbazên kolekirinê, jin û civakê diçewisîne û bêhnê li wan diçikîne. Bi navê mêrê jinê û bavê zarokan, hukmê xwe li ser wan ferz dike.



# 'Rewşenbîrên kurd xwedî mîras û ezmûnên giranbiha ne'

Rewşenbîr Zerdeştê Kal diyar kir ku berhemên ku rewşenbîr li Ewropayê diafirînin ew jî ne kêmî yên ku li welatên din tên afrandin, lê belê astengî pir in. Zerdeştê Kal da zanîn ku armanca rewşenbîr, nivîskar û wêjevanên kurd ya sereke ew e ku di riya nivîs, stranbêjî, şano û şêwekariyê re, bibin mîna vedengekê ji welatê xwe re.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Asta xebata rewşenbîrî li Ewripayê, pê re jî pirtûk û nivîs, hem jî berhemên nivîskar, rewşenbîr û wêjevan bi giştî li derveyî welat girîng in ji bo gelê kurd, lewma jî hêja ye ku mirov li ser raweste. Di derbarê heman mijarê de rewşenbîr Zerdeştê Kal bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyîvîn wiha bû:

**-Piştî ku şerê sûriyê rû da, gelek nivîskar û rewşenbîrên kurd ji tevahiya Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê koçberî derveyî welat, bi taybet Ewripayê bûn, HRRK'ê ji bo van rewşenbîran tê çi wateyê û çiqas hewldan hene ku sîwaneke rewşenbîrî ava bike?**

Helbet HRRK'ê berî vê krîza Sûriya yê hatiye avakirin û bi taybetî piştî serhildana 2004'an ya ku ji bajarê Qamşilo dest pê kir gelek nivîskar û rewşnbîr di wê demê de li Ewripayê dijiyan xwedan hev ta ku stûneke rewşnbîrî li Ewripayê damzirînin û rastî ev yek jî hate serî û ev xewn bû rastî ta ku wê demê bibin vedenga welat li Ewripayê. Bi damezrandina HRRK'ê re gelek armanc û hêvî hatin pêkanîn û ji wê demê ta vê demê herdem hewldana HRRK'ê ew e ku çanda kurdî bîne pêş. Xebata rewşenbîrî li Ewripayê bi kombûnên dihatin kirin, her wiha festîvalên bi salan li dar dixistin. HRRK'ê wek ku tê nasîn sîwana hemû rewşenbîr û zanyarên kurd li Ewripayê ye û her kes dikare cihê xwe tê de bibîne. Ji ber ku armanca sereke ew e ku tenê ji bo çanda kurdî kar û xebat dike. Ji çi hêlê de be bila bibe û her kes bi hemû rengên xwe himbêz dike. Ev tê wê wateyê ku mirovên rewşenbîr bi kêfxweşî û bêsînor dikarin bibin sîwana çanda kurdî, pê re jî kar û xebatê bike. Herdem hewldan jî hîn hene ku rewşenbîrên kurdan yên ku li Ewripayê dijîn bi ser hev de bîne bi rêka kar û xebatên xwe yên serbixwe ku giyanê çanda kurdî li nava kurdên diyasporayê, biçîne û herdem jî ev armanc li pêş e. Ji xwe piştî konfransa çaremîn ya ku di 10'ê Tebaxa derbasbûyî li bajarê Boxum li dar ket em hîn jî xwe dibînin xwediyê vî erkî ta ku em hîn berdewam bikin.

**Berhemên ku rewşenbîrên kurd li Ewrpayê diafrînin di çi astê de ne û astengiyên ku derdikevin pêşiya nivîsînê û xebata rewşenbîrî çi ne?**

Rastî berhemên ku rewşenbîr li Ewripayê diafirînin ew jî ne kêmî yên ku li welat tên afrandin lê belê astengî pir in. Helbet mirov dema ku ne li ser xaka xwe be wê kêmanî di pêdiviyan de hebe û bi taybetî jî erdnîgarî bandora xwe ya serke dilîze. Ji ber ku her mirov hestên xwe ji xak û xwezaya xwe werdigire dema ku ev yek jî tune be helbet wê dûrbûn bendora xwe di vê yekê de bilîze. Lê ji bilî vê yekê kar û xebat di warê rewşenbîrî ta asteke baş tê kirin.

**Çi cudayî di navbera hestên rewşenbîrên ku li derveyî welatê xwe dijîn û yên ku li ser axa welat dijîn de heye?**

Helebt wê cudahî hebe kêm zêde, ji ber mirovên ku li derve kar û xebatê dikin derbasî nava seqayekî din bûne. Bawer in ku em tenê li ser êş û azaran rawestin, wê hindekî zêdetir be. Her wiha jî em bi xwe hemû hestên xwe ji welat werdigirin. Em bi xwe li xerîbiyê bi tîna welat û hezkirina welat berdewam dikin ji ber ku welat ji bo me bingeha hest û ramanan e. Hewildanên me jî yên serke ew e ku em bibin mîna vedengekê ji welêt re, bi hemû rengên xwe çi di riya nivîs an stranbêjiyê yan şano yan jî şêwekariyê re.

**Gelo di dema heyî de gencîneya pirtûkxaneya kurdî çiqasî dagirtiye û çi girîngî bi berfirehkirina xebata rewşenbîrî heye?**

Pirtûkxaneya kurdî ta asteke baş têr mişt û dagirtiye û di xebata nivîsê de em weke kurd jî ne kêmî rewşenbîrên welatên dîtir in û di nava me kurdan de gelek nivîskarên berhemdar hene ku bi salan têkoşînê dikin ta ku sal bi sal ev pirtûkxana kurdî kêmî ti tiştî nebe. Di nava me de gelek nivîskar hene ku bi demê re jî dijîn û ev ya herî giringe ta ku em vî nifşê nû bi ser xwendinê de bikşînin pêwîste em bi demê re jî bijîn û helbet hewldan jî ji bo vê yekê hene.



**Da ku ziman, çand û wêjeya kurdî pêş bikeve li Ewripayê, her wiha dengvedanek ji bo kurdî çêbibe pêwîste çi were kirin?**

Helbet di destpêkê de divê kar û xebatên rewşenbîrî yên hevbeş di asta herî jor de be. Ji ber ku rewşenbîrek bi tena serê xwe nikare bi hemû kar û xebatan rabe. Pêwîstî bi hevkariyê heye ku hemû kes bi curên xwe yên cuda bi ser hev de bînin. Nivîskar, şanoger, stranbêj, muzîkjen û hemû rêxistinên candî yekdestiyekê çêbikin. Ta ku em bibin dengvedanek rasteqînî ku xwedî li welat û çanda xwe derdikeve.

# Ji Çiraxên huner û wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Hunermendê afirîner Mihemed Şemdîn (Bavê Elî) Yê ku rûgeşî li ser rûyê mîlyonan çêkir. Şano neynikek e ku taybetmendiyên civakê radixe ber çavan, û ew pişkdariya avakirina hizr û ramanên kesayetên xwe dike bi xêzkirina karakter û modêlên mirovî yên ku dişibihin wan û ji wan re raman, hest û cîhanên piskolocî (derûnî) yên ku bi cîhana wan re lihevhatî peyda dike, û dibe alîkar ku hişmendî û ramana endamên wê çêbibe.

Ew wekî navgîneka şahî, kêfxweşî, dilxweşkirina mirovan û xêzkirina rûgeşiyekî li ser rûyê kesên din tê hesibandin, ji ber ku Şano di civakê de avahiyeke yekgirtî ye û ew berdevkê civakê ye û ji bo avakirina civakê di warê çandî, siyasî û perwerdeyî de dixebite.

Tişta herî xweş di jiyanê de ew e ku tu bibî sedema xêzkirina rûkeniyê di rûyê kesên din de, û ya jê herî xweştir ew e ku merov bişirîneke xêz bike li ser devê mirovê ku rûkenî jê derketî be, û bikaribe dilekî tijî xem şa bike û bi germahî rondikê kesê xemgîn paqij bike, û bikaribe bihezkirina xwe dilê ku bi demê re hişk bûye geş bike.

Rûkenî kîlîta (mifteya) dilan e, xweşbînî dermanê birînan e û ew di jiyana mirov de karê herî xweşe, herî nazike û herî bibandor e.

Hunermend Mihemed Şemdîn (Bavê Elî) bi xebata xwe ya hunerî ya dem dirêj, karîbû rûkeniyekê (bişirînekê) li ser rûyê bi hezaran gelê kurd li herêma



Dêrikê xêz bike di şert û mercên herî dijwar de, dema ku rêjîma Sûriyê rê li ber kombûnên kurdan digirt û ahengên netewî û helkeftên niştimanî qedexe dikirin li herêmên kurdan,wî şanoyên herî xweş pêşkêşî mirovan dikir da ku mirovan dilşad bike û ku bigihêjin armancên xwe û bigihêjin xewnên xwe bi rêya naverokên skeçên xwe yên ku derbirîna evîna welat û xwefedakirina ji bo rizgariya wî welatî îfade dikirin .

Hunermendê pêkenok (komîd) Bavê Elî (Mihemed Şemdîn) di 24/11/1965'an de ji dê û bavên kurd (Sofî Izêr û Halîme) li bajarê Dêrikê yê Rojavayê Kurdistanê, di nav malbateke kurdê welatparêz a xizan de ku ji çar zarokan (yek kur û sê keç) pêk dihat, hatiye dinyayê .

Bavê wî mirovekî oldar bû,ji herdû çavan haviz bû (kor bû), ji ber vê yekê hunermend Bavê Elî ji ber şert û mercên zehmet ên aborî û jiyanê yên ku malbata wî tê de derbas dibûn, nekarî xwendina xwe ya seretayî biqedîne, ji ber wê jî neçar ma dest ji dibistanê berde û di temenekî biçûk de di kar û barên zehmet de bixebite, ji bo peydakirina pêdiviyên malbata xwe û dabînkirina pêwistiyên wan yên rojane.

Çavê felekê birije nehişte ku bi zaroktiya xwe şabibe, her du dê û bavên wî li navenda bajarê Dêrikê yek li pey yê din di qezayên otombêlan de jiyana xwe ji destdan û piştî mirina wan di gerevîska jiyanê de sêwî û bi tenê ma.

Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ya ji bo muzîka kurdî di temenekî biçûk de, di deh saliya xwe de dest pê kir û ew fêrî bikaranîna def, derbek, rîtm û casê bû,ew beşdar bû li gel gelek hunermend û stranbêjên kurd li herêma Dêrikê û gundewarê wê, wek derbikvan, daholvan û casvan di vejandina dawet û şahiyan de, li gel hunermend (Ehmed Cezîrî bavê Hozan, Azad Feqe, Ronî Cezrawî û Ferhan Ezeb) di salên heştîyan de di sedsala borî de.

Piştî ku Koma Cûdî hate damezrandin, di sala 1989'an de tevlî wî dibe, di destpêkê de wek ritimvan û derbikvan, û paşê di sala 1990'an de di Koma Cûdî de di beşa Şanoyê dest bi karê xwe yê hunerî dike,di heman salê de, di pîrozbahiya Newrozê de çend rol di şanoyê de lîstin û paşê ew beşdarî gelek çalakiyên neteweyî, şahiyên niştimanî, û cejnên Newrozan bû ye, weke hunermendekî şanoger ê komedî yê profesyonel, heta roja me ya îroyîn jî bêwestan xebatên xwe didomîne.

Wî gelek skeç û şano pêşkêş kirin û di wan de rolên sereke lîstin û bi liv û tevgerên xwe yên hunerî yên afirîner, bi dîmenên xwe yên komedî yên balkêş û rabûna wî ya bilehîstina rolên jinan ên diyar û afrîner karîbû rûkenîyekî li ser rûyê bi hezaran zarok û mezinên herêma Dêrikê çê bike.

Piraniya metinên skeç û şanoyên wî ji aliyê şanoger Sekvan Torî û nivîskar Diljan Cûdî "Bavê Ceger " ve hatine nivîsandin û derhêner kirin.

Komek ji hunermendên şano û lîstikvaniya bajarê Dêrikê bi wî re beşdar bûne, wek (Sekvan Torî, Ebûdê, Kadar, Ednan Domo, Esed Şawîş, Husên Sebrî, nemir Mihemed Hac Casim, Husên Taher, Necîm, Nûrî Birîndar, rehmetî Bavê Delîl, Fatima Ezedîn, Rehmetî Sîham, Nisrîn Çeto, Xurbet, Cîhan Çiyayî...)

Di nav şano û skeçên wî yên herî navdar de ev in:

1- Şanoya efserê Tirk yê tirsonek
2-Skêça Seyda.
3-Skêça Diktor
4- Şanoya Qorocî
5-Şanoya Pingavên Dîrokê
6-Skêça Dayîkê
7- Şanoya berxwedana Mazlûm Dogan
8- Skêça Nûçe
9-Şanoya Mamoste.

Wî gelek skeçên komedî wek du kes an jê bi tena serê xwe pêşkêş kirine û di nav wan de yên herî navdar ev in:

1-Demûşo
2-Hunermend
3-Qîyqanê
4- Mirîşka Xecê
5-Yara mena lêv pitik
6-Dayê naçime gunda
7-Zimanê Kurdî
8- Newroz
9-Korona.
10- Cejna evînê.

Li Lubnan, Heleb, Efrîn û Mizgeftûkê wî şano û lîstikvanî pêşkêş kiriye.

Di vê dawiyê de çend beş ji şanoya Suadê ku ji aliyê wî ve hatiye nivîsandin û derhêneriya wî hatiye kirin, di gelek malper û torên civakî de hatiye belavkirin, dilxweşî û razîbûna temaşevanên Kurd wergirtiye.

Ew bi skeçên xwe beşdarî gelek cejnên neteweyî û pîrozbahiyên herêmî bû ye, wek:

1-Derçûkirina dewreyên Yekîneyên Parastina Gel
2- Vekirina navend û dezgehên rêveberiya xweser
3-Pîrozkirina roja karkeran
4-Pîrozbahiyên Roja Zimanê Kurdî
5-Pîrozbahiyên 15'ê Tebaxa bi rûmet.

Di van demên dawî de şanogerê komêdî Îsmaîl û hunermendê nemir Zîdan Şêx Qasim bi wî re di çend skeçan de beşdar bûne wek (Xwezgînî – Newroz).

Hunermendê şanoger Bavê Elî zêdetirî sî û pênc salên jiyana xwe di xizmeta mîrat û şanoya kurdî de derbas kir û tevî nexweşiya şekir û kêmbûna dîtina çav, hîna jî hunera xwe ya herî bedew a şanoyê pêşkêş dike da ku ken li ser rûyê gelê xwe xêz bike.

Sih û pênc sal afirînerî û serkeftin û hezkirina hemû gelê Kurd yê li herêma Dêrikê yê wî nas dike jê re çê dibe. Tevî ku di şert û mercên herî dijwar de ji gelê xwe yê Kurd re, ji doz û tevgera xwe re xizmetên gewre pêşkêşî kirine, ji hêla ti aliyên peywendîdar ve tu girîngî û teqdîr ne girtiye û îro ji her demî zêdetir pêwîstiya wî lênihêrîna tenduristî û baldariyê he ye û ew êmaneteke di stûyê me hemûyan de. Ji wî re tendurustî, serkeftin û afirîneriya zêdetir dixwazim

# Avakirina bajarê pêşesaziyê projeyeke stratîjîk e

Şaredariya Gel a Amûdê di 23'ê Adara 2024'an de, dest bi projeya avakirina bajarê pêşesaziyê li bajarê Amûdê kir. Her wiha di vê projeyê de 200 dikan hene û li kêleka wê stasyoneke sotemeniyê jî tê avakirin. Armanca avakirina bajarê pêşesazî ew e ku qerebalix, çûn û hatina trafîkê li hundirê bajarê Amûdê kêm bibe.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Beriya Şoreşa 19'ê Tîrmehê bajar û navçeyên kurdan li Rojavayê Kurdistanê ji aliyê Hikûmeta Baas ve dihat paşguhkirin, bi taybet di aliyê xizmetguzarî û estetîka bajêr de, ji ber ku tu gavên pêşketinê nedihatin avêtin. Lê piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê û bi avabûna Şaredariyên Gel re, hewl hate dayîn ku xweşikbûyîn, rêxistinkirin û estetîka bajêr, her wiha rehetiya welatiyan ji nû ve were dîzayînkirin, li ser vê bingehê Şaredariyên Gel li hemû bajarên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek proje pêk anîn. Her wiha yek ji wan projeyan avakirina pêşesaziyeke nû ji bû bajarê Amûdê re ku ev yek wê bibe gaveke baş ji bû xizmeta welatiyan û çareserkirina qerbalixa di nava bajêr de, bi taybet di pêşesaziya bajarê Amûdê de.

### Avakirina bajarê pêşesazî projeyeke istratîcîk e

Şaredariya Gel a bajarê Amûdê di 23'ê Adara 2024'an de, dest bi projeya avakirina bajarê pêşesazî li bajarê Amûdê kir. Ev projey, yek ji projeyên istratîcke, bandoreke dirêj û mezin li jiyana gel dike, di heman demê de piştî zêdebûna niştecih û aliyatan çûn û hatineke mezin di nava bajêr de pêk hat, ev yek hişt ku Rêveberiya Şaredariya bajarê Amûdê bi rengekî rêk û pêk li ser vê yekê bisekine û xiste rojeva xwe, da ku projeya bajarê pêşesazî li bajarê Amûdê bi cih bîne, ew jî li gorî pilansaziya rêxistinî ya heyî ye, xaka vê projeyê ji hêla qanûnî ve amede bû. Şaredariya bajarê Amûdê ev proje hilbijart û hevpeymanek bi kompaniyekê re çêkir, ew kompaniya jî dest bi karê xwe kiriye. Li gorî hevpeymana kompaniya ya bi şaredariyê re di 23'ê Adara 2024'an de kar û xebat hat destpêkirin û wê heta sal û 3'ê mehan dewam bike.

### Armanca avakirina bajarê pêşesazî kêmkirina çûn û hatina ya li bajêr

Projeya bajarê pêşesazî ya li bajarê Amûdê ku li derveyî navenda bajêr e, di Adara îsal de dest pê kir. Li gorî plansaziya birêxistinkirinê di projeyê de 200 dikan û li kêleka wê stasyoneke sotemeniyê jî wê were avakirin. Rûbera bajarê sînaî tevî kolan û peyarêyan 92 donim e. Rûbera her dikanekê dê di navbera 100 heta 160 metreyan de be. Li gorî çavdêrên projeyê,



dê belavkirina dikanan li gorî sîstema kirêkirinê bo xizmeta şaredariya gel be. Dê di bajarê sînaî de dikanên çeksazkirina erebeyan, alavên çandiniyê, kargehên sînaî hebin. Armanca şaredariyê ji vê projeyê qirêjî, qerebalix û çûn û hatina trafîkê li hundirê bajarê Amûdê kêm bibe. Her wiha heta niha jî, şaredariya gel a Amûdê ji sedî 30'ê projeya avakirina bajarê Sînaî pêk aniye. Li gorî plansaziyê ger tu astengî dernekevin, dê di Pûşbera 2025'an de proje bi dawî bibe.

Hêjayî gotinê ye ku li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, projeya avakirina bajarê sînaî ya li bajarê Amûdê ya sêyemîn e. Ji ber ku li kantona Minbic û bajarê Girkê Legê yê kantona Cizîrê jî bajarên wiha tên avakirin.

# Jinên Dêrazorê tevî zehmetiyan jî hilberîna pembo didomînin

Jinên Dêrezorê ku tevî gelek pirsgirêkên weke guherîna avhewayê û êrişên li herêmê hilberîna pembû didomînin, diyar kirin ku tevî zehmetiyên ku rû didin jî ew bi hêvî ne.

Çandiniya pembû ne tenê dibe sedema geşbûna aboriya herêmê, di heman demê de ji bo beşên cuda yên civakê jî derfetên kar ava dike. Di van salên dawî de ji ber bandora guherîna avhewayê hilberîna pembû kêm bûye. Çandiniya pembû yek ji çavkaniyên sereke yên debara şêniyên kantona Dêrezorê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Cotkarên jin ên li bajar zêdebûna bihayê sotemeniyê û avê jî di nav de, bi êriş û gelek zehmetiyên ku bandora neyînî li hilberînê dike re rû bi rû ne. Koperatîfa Giştî ya Pembû ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê navendekî ku ji stendin,



depokirin, firotin û paqijkirina pembû ava kir.

### Ji seatên sibehê ve dest bi kar dikin

Ji cotkaran Sebha El Eswed a li ser erda xwe kar dike got: "Em ji sibehê zû ve derdikevin û heta roj diçe ava em kar dikin. Tevî rewşa zehmet em kedeke mezin didin ji ber pembû jêdera debara jiyana me ye. Em ava bîran ya şor bikar tînin. Ji bo çandiniyê nabe ji ber wê karê me duqat zehmet dibe. Pembû yek ji berhemnê herî zêde pêwîstiya wê bi avê heye. Divê bi rengekî birêxistinkirî û berdewam were avdan. Pêwîstiya pembû bi zêdetirî 12 caran ji avdanê heye da ku mewsima cotkar biser bikeve."

### Av têra erdên wan nake

Sebha El Eswed anî ziman ku îsal çandiniya pembû ne pir serkeftî bûye û wiha domand: "Çandina vî mewsimê ne serkeftî ye ji ber em erdên xwe bi ava bîran av didin û ava wan têra erdên me nake. Berhemdayîna pembû vê salê daketiye. Di rojekê de em tenê kîsekî dadigirin. Di demên berê de ne wisa bû. Lê belê em bi karê di erdên xwe de girêdayî ne ji ber alîkariya me di debara jiyana me ya rojane de dike, her wiha sewalên me jî jê sûd digrin."

### 'Em ji seatên sibehê ve dest bi kar dikin'

Kedkar Ofa EL Qemer jî anî ziman ku ew her sibeh şefeqê radibim ji bo karê mala xwe xilas bike û berê xwe dide karê xwe di erdên çandiniyê de heta nîvro. Ofa EL Qemer wiha got: "Destpêkê em erdê diçînin û ji nebatên bi zirar û sitiriyan paqij dikin. Em zehmetiyan dikşînin ji ber alavên me yên nûjen tune ne. Paşê em bizran dixin erdê de. Kalîteya berhemdayînê sala par li gorî îsal baştir bû."

### 'Tevî zehmetiyan jî em bi hêvî ne'

Emel El Elî jî got: "Piştî bidawîkirina berhevkirina pembû em êzingan didin hev. Paşê em bi erebeyeke taybet vedughêzin malê ji bo em xwarinê li ser çêkin yan bixin tenûrê û hwd de. Em pembû difroşin bazirganan paşê ew jî dişînin herêmên ku pembû lê tên bikaranîn. Pembû dikeve gelek pîşeyan de mîna cil ta zeyt û hwd. Tevî zehmetiyan jî em bi hêvî û israr in. Bi riya berhevkirina pembû kêm be jî dikarin bibin xwedî aboriya xwe ya serbixwe."

**NÛ JINHA**



# 'Fikir û paradîgmaya Abdullah Ocalan kilîta çareseriya pirsgirêka Rojhilata Navîn e'

Rojnamevan Selman Osman anî ziman ku fikir û paradîgmaya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kilîta çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn e.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan modernîteya demokratîk kiriye alternatîfa modernîteya kapîtalîst ku sîstemeke desthilatxwaz û karperest e û li hemû cîhanê mirovahî rastî gelek pirsgirêkan aniye. Parêzvanên modernîteya kapîtalîst modernîteya demokratîk wek metirsî dibînin, ji ber ku li dijî desthilatxwazî û zilmê ye. Ji ber vê yekê ji raman û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ditirsin û ev 25 sal in tecrîdek sîstematîk li ser tê maşandin. Rojnamevan Selman Osman têkildarî vê mijarê ji **ANF**'ê re axivî.

Selman Osman di destpêka axaftina xwe de bal kişand bi ser fikr û ramanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û got: "Di rastiyê de eger em behsa fikr û ramanên Rêber Apo bikin wek çareserî ji bo pirsgirêkên gelên Rojhilata Navîn û gelê Kurd, divê em vegerin ser şîroveyên dîrokî yên Rêber Apo. Ji ber ku ew pirsgirêkên ku moderniteya kapîtalîst afirandine, reheke wan a dîrokî heye. Rêber Apo ji bo çareserkirina van pirsgirêkan dîrok wek bingeh wergirtiye. Berî Rêber Apo yên ku behsa dîrokê kirine, dîrok wek rêzebûyer nasandine.Her wiha hin dîroknasên Rojavayî dîroka mirovahiyê di pênc hezar salan de sînordar kiriye, lê pênc hezar sal tenê



beşeke biçûk a dîroka mirovahiyê ne. Qonaxa Serdema Kevirîn a Kevn û paşê Serdema Kevirîn a Nû heye, ku di van qonaxan de jinan di civakê de roleke karîger lîstiye, afirandina şaristaniyetê hatiye kirin, bo nimûne çandinî û destpêka nivîsê. Ji ber vê yekê çênabe ku ev dîrok bê piştguhkirin. Rêber Apo ji dîroknasên din cudatir li dîrokê vekolaye û şîrove kiriye."

Osman, qala nêrîna dîrokî ya Karl Marx û nêrîna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir û wiha pê de çû: "Marx pevçûnên çînî wek dîrok bi nav dike. Li gorî nêrîna wî, eger jêrxana aborî pêş bikeve, wê demê civak jî pêş dikeve û dîrok jî çêdibe. Lê di nêrîna Rêber Apo de ev yek cuda ye. Rêber Apo dibêje ku dîrok di pêşketina civakê de ji hilkişîn û dakişînan pêk tê, bi gotineke din têkiliya wê bi têkoşîna gelan re heye. Eger em bi wê nêrîna Marksî lê binêrin, tu derfet ji bo têkoşîna gelan namîne."

Osman da zanîn ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dîrokê dike sê qonax û wiha dom kir: "Rêber Apo dîrokê dike sê qonax: civaka siruştî, civaka koledar û civaka demokratîk. Çima Rêber Apo girîngiyê dide dîrokê? Ji ber ku bawer dike moderniteya kapîtalîst mirovahî ber bi rewşeke xerab biriye, rehên wê vedigerin ser dewlet-bajarên Sumerî û Babilî û Akadî. Ew dibêje ku ew netewe-dewletên ku îro li Rojhilata Navîn hene, moderniteya kapîtalîst rol daye wan."

Selman Osman, wiha domand: "Rêber Apo şîroveya dîn û baweriyên dîrokî dike û dibêje ku ew baweriyên ku di dîrokê de hebûn, bersivderên qeyranên civakê bûn. Pêxember Mihemed kariye eşîretê derbas bike û umetê vejîne, li hemberî umetê jî behsa seltenetê dike. Rêber Apo dibêje seltenet ew desthilatdariya ye ku Marx behsa wê dike. Heman desthilatdarî ye ku di roja me ya îro de heye.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dibêje çawa ku di dîrokê de pêxemberan li dijî Fîrewn û Nemrûdan şoreş kiriye, di roja îro de jî divê her kesekî bawermend li dijî desthilat û Fîrewnên sîstema serdest bisekine. Rêber Apo dibêje çawa ku pêxember li dijî desthilatxwazan sekinîne, divê takekesên Misilman jî li dijî Fîrewnên vê serdemê bisekinin. Niha Erdogan û hevfikrên wî bûne Fîrewnên serdema me. Ji ber vê yekê Rêber Apo daxwazê ji me dike ku em li dijî van Fîrewnên serdemê bisekinin û vegerin civaka siruştî, ew civaka ku çîn tê de tune ne."

Rojnameger Selman Osman bal kişand bi ser kevana Zagros û Torosê ku dergûşa şaristaniyetê bûye û wiha berdewam kir: "Rêber Apo behsa Rojhilata Navîn dike û dibêje ku ew netewe-dewletên ku îro hene, sedemên mezin ên xirabiyên mirovahiyê ne. Ji ber vê yekê wî moderniteya demokratîk kiriye alternatîfa moderniteya kapîtalîst. Di moderniteya demokratîk de yek netewe û yek ziman û yek dîn û yek al tune ye. Bawerî û dîn beşek in ji çanda gelan, divê ferzkirina dîn û baweriyê tune be.

Her neteweyek xwedî çanda xwe ye, çênabe rastî jenosîda çandî werin, wekî jenosîda ku bi serê gelê Kurd de hatiye. Li rojavayê Kurdistanê di bin fikr û paradîgmaya Rêber Apo de ev yek hatiye praktîzekirin. Em dibînin ku Kurd û Ereb bi hev re dijîn, çewisandina zayendî tune ye, zarokên Kurd û Ereb hwd... bi hev re li dibistanan dixwînin."

Selman Osman behsa pêngava 15'ê Tebaxê ya 1984'an kir ku rê li ber pişaftina gelê Kurd girtiye û got: "Tirkiyeyê di 100 salên borî de hewl da ku gelê Kurd ji holê rake û bihelîne, lê pêngava 15'ê Tebaxê dibe asteng li pêşiya pişaftina Kurdan û gelê Kurd zindî dihêle.

Dema ku Rêber Apo li dijî sîstemê disekine, ew wî wek metirsiyekê li ser xwe dibînin. Dema ku Rêber Apo pirsgirêkên Rojhilata Navîn dibîne û dibêje ku netewe-dewlet û sîstem in, ew hest bi metirsiyê dikin. Ew ji fikra Rêber Apo ditirsin ku dibe sedema rizgarkirina gelên Rojhilata Navîn."

Rojnamevan Selman Osman bal kişand bi ser tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û wiha bi dawî kir: "Çar sal in ku tecrîdeke giran li ser Rêber Apo heye, malbata wî jî nikare wî bibîne. Dewlet dixwaze di kesayetiya Rêber Apo de gelê Kurd ji holê rake. Bi azadbûna Rêber Apo dê pirsgirêka gelên Rojhilata Navîn û Kurd çareser bibe, ji ber vê dewlet tecrîdeke giran daniye û naxwaze Rêber Apo azad bike. Ji ber ku encama wê dizane.

Ez ji rojnameger û rewşenbîr û nivîskar û hemû gelên azadîxwaz daxwaz dikim ku beşdarî kampanyayên azadiya fizîkî ya Rêber Apo bibin, dakevin kolanan û daxwaza azadiya fizîkî ya Rêber Apo bikin."

# Silêman Ehmed 341 rojin ji aliyê PDK'ê ve hatiye girtin

**Navenda Nûçeyan**

**Rojnamevan Silêman Ehmed 341 rojin ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin. Rojnamevan Silêman piştî 279 rojan hate dadgehkirin û PDK'ê 3 sal cezayê girtîgehê lê birîn.**

Edîtorê beşa Erebî ya ajansa ROJNEW'ê Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmeha 2023'yan ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25'ê Cotmeha 2023'yan dema xwest di deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin û piştî heft mehan parêzeran karîn hevdîtinê li gel de bikin. Rojnamevan Silêman Ehmed 340 rojin di girtîgeha PDK'ê de tê girtin.

Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê di daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast de got ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine.


Herî dawî di bin zextên sivîl yên rojnameger, sendîka û rêxistinên li ser asta herêmî û navnetewî de, roja 22'yê Gulanê destûr hat dayîn ku parêzerên wî li girtîgeha Asayîşa Dihokê hevdîtinê pê re bikin.

Yek ji parêzerên Silêman Ehmed, Beşdar Hesen di derbarê hevdîtina li gel Silêman de agahî da ajansa me û got: "Em bi Silêman Ehmed re li odeyekê rûniştin. Di hevdîtinê de Silêman Ehmed spasiya hemû kesên ku ji bo wî hewl dane kir û silavek taybet ji hemû xebatkarên Ajansa Rojnewsê re şand. Her wiha Silêman Ehmed spasiya hemû rêxistin, sendîka, rojnamevan û welatparêzan kir ku hewl dane wî azad bikin. Em gelek keyfxweşin ku me rewşa tenduristiya wî baş dît, tenê daxwaza wî ew bû ku heta serbest bê berdan zextên heyî berdewam bike."

Parêzer Beşdar Hesen tekez kir ku niha li gor madeya 1 a yasaya jimare 21 ya sala 2003 ya Parlamentoya Kurdistanê, ku girêdayî 'têkdana ewlekariya netewî' ye, zêdetir ji 7 mehane ji aliyê dadwer ve tê ragirtin û got; "Lê belê heta niha tu tomet li ser wî nehatine tesbîtkirin. Me parêznameya wî wergirt û piştre serdana dadwerê Dadgeha Lêkolînê ya Asayîşa Duhokê kir û got deriyê me ji we re wek parêzer vekirî ye."

Her wiha Parêzer Beşdar Hesen got; "Emê di demên pêş de ji bo ku doza wî bibin dadgehê xebatên xwe zêdetir bikin û ji xelkê re ragihînin ku çi rojek Silêman Ehmed bê dadgehkirin wê bê berdan. Em geşbînîn ku bi kêfxweşî mizgîniya berdana wî didin. Bi gotina wî, heta niha bi tiştên tê tometbarkirin nehatiye ispatkirin û di dema lêpirsînê de derketiye holê ku bi awayekî fermî çûye Rojavayê Kurdistanê û vegeriyaye û xwediyê destûra rûniştinê ye."

Herî dawî 3'yê Hezîranê Dadgeha




Sûc ya Yek ya Duhokê roja yekê ya rûniştina dadgehê ya Silêman Ehmed weke 30'ê Hezîrana îsal, diyar kir. Lê dadgehê bi hêceta dadwer ne amadeye û asayîşê kel û pelên rojnamevaniyê ne şandiye, danişîn ji bo 29'ê Tîrmehê hatibû taloqkirin. Di 29'ê Tîrmehê de Dadgeha Dihokê 3 sal cezayê girtîgehê li Silêman Ehmed birî.

Derbarê madeya ku Silêman Ehmed pê tê darizandin, parêzerê wî Beşdar Hesen wiha gotibû; "Ew madeya ku muwekîlê me Silêman Ehmed pê tê darizandin, madeya yek ya yasaya hejmar 21 ya sala 2003'yê ya Parlamentoya Herêma Kurdistanê ye ku taybete bi têkdana ewlekariya Herêma Kurdistanê."

Herî dawî Parêzerên Silêman biryar îtîraz kirin û dosyaya Silêman Ehmed radestî Dadgeha Temîzê kir. Parêzer Nerîman Ehmed got, dosya Silêman Ehmed li ber destê Dadgeha Temîzê ye û li bende ne ku biryara dawî li ser bide.

# Encama Komploya 9'ê Cotmehê

**Aslan Aslan**

Di 9'ê Cotmeha 1998'an de komployeke navneteweyî li dijî Rêber Apo dest pê kir. Ev komplo di şexsê Rêber Apo de li dijî Kurdan, li dijî Kurdistanê û Rojhilata Navîn bû. Jixwe, Rêber Apo piştre di nirxandinên xwe de qala wê pêvajoyê dike. Rêber Apo tîne ziman ku bi 9'ê Cotmehê re, hêzên navnetewî dest li Rojhilata Navîn werdan. Rêber Apo girtina xwe jî wekî destpêka şerê sêyemîn ê cîhanê pênase dike. Heger ji 9'ê Cotmeha 1998'an em binihêrin, wê bê dîtin ku bûyerên piştre çawa vê yekê îsbat dikin. Ji wê demê ve her tişt serûbinî hev bû û tiştek nema wekî berê. Hevsengiya li Rojhilata Navîn bi temamî hate guhertin. Pergala gelek welatan hilweşiya û lîderên hin welatan jî ji desthilatdariyê ketin.

11'ê Îlona 2001'ê li Emerîkayê bi teqînên mezin re hincetek ji Emerîkiyan re derket da ku berê xwe bidin Rojhilata Navîn. Ji Efxanistanê heta bi Iraqê gelek dever hilweşandin û veguherandin gola xwînê. Bi vê yekê re jî gelek tevger û rêxistin bêbandor kirin. Li




Iraqê Sadam Huseyîn xistin û daliqandin. Yek ji hedefên Emerîkayê ew bû ku PKK'ê jî bêbandor bike. Lê kir û nekir, nekarî tiştekî bi dest bixe. Piştî wê bi demekê jî li welatên Rojhilata Navîn guherînên mezin çêbûn. Ji Misrê heta Lîbya û Sûrî serhildanên gelan çêbûn. Lîderên hin welatan ji textê desthilatdariyê ketin. Li Rojava jî şoreşa gelan dest pê kir. Yên dixwestin bi kompoyê Rêber Apo û tevgera azadiyê tine bikin, li şoreşa Rojava qelibîn.

Ji bo têkbirina vê şoreşê gelek komên çete ava kirin û bi ser Rojava de şandin. Lê dîsa jî encam negirtin. Di encamê de xeta sêyemîn bi ser ket. Heger em ji pêvajoya 9'ê Cotmehê û vir ve werin, wê bê dîtin ka encameke çawa derketiye holê. Di encama kompoyê de dewleta Tirk wendakir. Encama ku dixwest bi dest nexist. Rêber Apo û PKK'ê têk neçûn. Nav û dengê wan îro ji aliyê milyonan ve tê zanîn. 25 sal berê ew kesên ku li dijî PKK'ê bûn, îro bûne PKK'yî û doza azadiya fizîkî ya Rêber Apo dikin.

Di nava 25 salan de dewleta Tirk gelek bedel dan. Gelek wezîr û serokwezîr hatin guhertin. Her yekî ji wan got ew ê PKK'ê biqedînin, lê nekarîn bikin. Ji ber ku PKK'ê ne kaniyeke ku biçikînin, ne jî agireke ku bitefînin. PKK'ê ruhekî ebedî ye. Îro bi milyonan kes li dora PKK'ê bûne xelek. PKK'ê navê ruhekî fedayî ye. Yê ku ev ruhê fedayî ava kir jî Rêber Apo ye. Şehîdên vê dozê di oxira têkoşîna azadiyê de canê xwe feda kirin.

Dewleta Tirk bi komplo û komplogeran re jî nekarî doza Kurdistanê bitepisîne. Heger em li beriya komployê binihêrin û niha binihêrin rewşeke cuda xuya dike. Ji aliyê siyasî û civakî ve tevgera azadiyê xurttir bûye. Dewleta Tirk û hêzên komploger çiqas bi ser PKK'ê de çûn, PKK'ê jî ewqas mezin bû. Êdî ji



vê saetê pê ve, kes nikare tevgera azadiyê têk bibe. Heger komploya wan navneteweyî be, têkoşîna Kurdan jî navneteweyî ye.

Di encama komploya 9'ê Cotmehê de hêzên komploger û dewleta Tirk negihiştin meqseda xwe. Heger zanîbana wê bi komployê re encam bi vî rengî be, ew komplo nedikirin. Ji ber vê yekê jî ew hêzên komploger ti carî nesekinîne. Ji bo têkbirina têkoşîna Kurdan bi şev û roj êriş dikin. Ji Rojava heta Şengalê, ji Başûr heta Bakurê Kurdistanê êrişên hovane dikin. Heger Rêber Apo li gorî xeta wan û siyaseta wan tevgeriyaba îro ew ê ne li Îmraliyê bûya. Tecrîda li Îmraliyê di heman demê de berxwedanekê jî nîşanî me dide. Ji ber ku berxwedan heye, tecrîd jî heye. Komploger û dewleta Tirk bi hêrs in ka çawa nekarîne di 25 salan de bigihêjin encamekê.

Ji bo vê yekê jî her cûre êrişên qirkirin û dagirkeriyê li Kurdistanê pêk tînin. Komploya 9'ê Cotmehê peymaneke navneteweyî bû û gelek welatan cihê xwe tê de girt. Yên ev peyman çêkirin, îro li meydanê tine ne. Lê PKK'ê û Rêber Apo îro li meydanê ne û li dijî hêzên komploger li ber xwe didin. Ji qewla Çiyager ve "Wê dawiya wê bi heybet be". Encama vê komployê jî êdî her kes dibîne û yê ku encamê diyar dike jî Rêber Apo ye.

# Qatilê Narîna biçûk Dostaniya çil salî ya Ensarîoglu

**Volqan Elî**

Xwendekarên rojavê dişopînin dizanin. Hê bûyera Narîna biçûk nû bû. Bi temamî nehatibû naskirin ku çi, çi ye? Rengê karesata wê zaroka temen biçûk lê serpêhatiya wê mezin bi temamî ronî nebibû. Em wisa dibêjin lê heqîqet tam jî ne wisa ye. Ji ber ku bi taybetî li Bakur, wekî dibêjin 'li ber ava Dîcleyê berxikek jî wenda bibe' dewleta Tirk jê berpirsiyar e. Hema em vê ji ber ku dewleta Tirk dijminê gelê Kurd e, em jî hewl didin îftira bavêjin sukra wî, nabêjin. Sedema vê heye. Em nûka nakevin nava sedemên dîrokî, sosyolojîk û polîtîk. Na! Yanî bûyer ji destpêkê ve ronî bû. Xwendakar ê bêjin, "ma çawa çêbû. Tevî dewleta Tirk nexwazibe jî, ji bo ku bûyerê fêm bikin ev çend hefte ne pê ketine". Ez bi xwe, ne di wê baweriyê de me. Jixwe hurguliyên bûyerê pir jî ne girîng in. Yanî piştî ku Narînê bi şiklê kirêt xatir ji dinyayê xwest, bû qurbaniya paşverûtiya malbat û hişmendiya qirker a dewleta dagirker ê Tirk, me karîbûya Narîna biçûk ji bo kêliyekê li jiyanê vegerandana, Narînê dê ji her kesî re bigota, "piştî ku we ez ji jiyanê



qut kirim, hûn felaketa hatiye serê min ronî bikin yan nekin ji min re ne xem e".

Rola Dagirkeriyê di vê buyerê de çi ye? Hê bûyer nû qewimî bû, ti kesî hê tiştekî zelal neanîbû ziman. Hevkarên dagirkeriyê xwe avêtin ortê. Dest biaxeftinê kirin. Malbata Ensarîoğlu ya hevkarê Erdogan digot, "ew gund û malbat tev de dostên me yên çil salî ne". Hinekên din jî bi rêya medyaya dijîtal hewl didan 'tiliya PKK'ê' bixin nava xwîna Narîna biçûk. Digotin "vaye PKK'ê zarokan direvîne, mimkun e Narîn jî revandibe". Yê sûcdar dizane ku parastina herî baş êrîş e. dagirkerî jî bi vê helwestê tevdigeriya.

Çawa ku berpirsiyarê hemû komkujiyan dewlet e, kujerê rastîn ê Narîna biçûk jî dewleta Tirk a dagirker e. Hişmendiya wê ye. Rast e ku Narîn bi tang, top û balafirên dewleta Tirk nehatiye kuştin; lê ji ber hişmendiya wî ya nêzîkbûna jiyana mirov û jinan hatiye qetlkirin. Êdî li Tirkiye her kes dizane, edalet tine, yê/a ku destê xwe bikeve xwîna jinê yan jî kesekî, dikare bê ceza yan jî bi kêm ceza xwe xelas bike. Ev hişmendî hema ji ber xwe bi civakê re çênebûye. Hê Erdogan ji beriya dehan sal ji bo Kurdên tevlî serhildanan dibû digot, "zarok be jî jin be jî em ê rehmê li kesî nekin". Bi rastî jî wisa kirin; bi dehan zarok û jin di serhildanan de hatin qetilkirin. Zarokeke di dest de kevir hebe, wekî ku bombeyek pê re hatibe peyda kirin cezayê bi dehan sal danê.

Îro li Tirkiye eger di navbera du hevseran de dema nakokiyek derkeve û ew li gorî xwe çareseriyê nebînin, zilam dikare bi hêsanî êrîşî hevsera xwe bike. Êdî bi armanca kuştinê be yan na, pir ne girîng e. Jixwe ji ber ku dewlet hem ji aliyê hişmendî û hem jî ji aliyê madî-cezakirinê ve destekê dide kesên wisa, ku bê fikareke zêde ew dikarin her tiştî bikin. Ji ber ku ji aliyê dewletê ve tê teşwîqkirin. Teşwîqa wî çi ye? Ji ber ku dizane dewleta dagirker ceza nade wî. Ev rewş, ji bêcezabûnê zêdetir hişmendiyekê bi mirovan re çêdike. Kuştina jinan, zarokan heqekî rewa ye(!) Ya girîng jî ev e; piştî ku wijdanê mirovan hate kohkirin ne hewce ye ku dewlet, zarok û jinan bikuje. Li ser navê dewletê dagirker her kes, her malbat, her bav û bira, li berambê hev dibin, gurê zaroka xwe, gurê hevsera xwe, gurê cîranên xwe û gelên derdorê. Piştî vê, rojê çendîn jin, zarok û mirov werin kuştin ne kes dibîne û ne kes dibihîze.

Vaye sedemek qetilkirina Narîna biçûk ev e. Wekî Ensarîoğlu gotibû, jixwe ew dostên çil salî yê dewleta dagirker bûn. Dibe ku di kuştina Narîna biçûk de sedema herî veşartî ya mezin jî wisa were nirxandin: Jixwe ji bo dewleta dagirker a Tirk ev stratejiyeke mezin e. Stratejiya mezin çi dike hedef, armanca wê çi ye?

Ya yekê, bi taybetî li Bakur civakê, ji nirxên wê yên exlaqî dûr bixe. Hewl bide ji bo vê, civakê bi rêxistinên kontra yên wekî-Huda Par û madeyên hişbir, ji hindur ve pûç bike. Ya duyen; şerê şoreşgerî yê ku ev pêncî sal in dimeşe civaka Kurd hişyar kiriye, cîhan jê agahdar kiriye. Divê hê zêde Narîn ji jiyanê werin qutkirin ku Kurd li xwe biheyirin, ji xwe fedî bikin û cîhan jî Kurdan wekî civakeke krîmînalîze-sûcdar nas bike. Heya ku pêşî li vê fikra wekî kabûs a dewleta dagirker ê Tirk neyê girtin, ev stratejî di mejiyê wî de neyê xeniqandin dê Narînên biçûk timî berwext xatir ji me nexwazin û biçin!



# Xeta Sêyemîn eniya hevpar ya çareseriya pirsgirêka gelê kurd e

Rêber Apo tîne ziman ku Rojhilata Navîn di nava agir de ye û çareseriya wê jî xwe dispêre hêza gelan û têkoşîna wan a xeta sêyemîn. Li ser wê bingehê rêxistinkirin û perwerdekirina gelan wê zemînê têkoşîna hevpar ava bike û destê neyaran ji Rojhilata Navîn qut bike.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Pirsgirêka Kurd pirsgirêkeke kûr, dîrokî û siyasê ye. Cûdabûna îdeolojîk û taktîkî ya di navbera hêzên Kurd de ne astenge, li pêşiya avabûna eniyek hevpar ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd û bidestxistina mafên rewa yên Kurd heye. Li Rojavayê Kurdistanê projeya Konfederalîzma Demokratîk û nimûneya xeta sêyemîn pêk hatiye. Ji ber vê Amerîka, Rûsya, Îran û Tirkiye ji xeta sêyemîn ditirsin. Vê projeyê li pêşiya projeya xwe ya sîstema sermayedarî asteng dibînin, ji ber wê difikirin ku berjewendiyên wan dixe nava metirsiyê. Çima herî zêde Tevgera Azadiya Kurdistanê li rastê êrîşan tê? Ji ber di avabûna hevsengiyên nû yên herêmî de xwedî roleke diyarîker in. Rêxistinkirin û perwerdekirina gelan wê zemînê têkoşîna hevpar ava bike, ji bo destê neyaran ji Rojhilata Navîn qut bikin.

### Xeta seyemîn xeta bawerî û cihrengiya pêkhateyan e

Xeta sêyemîn ne projeyeke demkî ye. Xeteke siyasî û stratejîk e. Di vê stratejiyê de rola herî girîng dikeve li ser milê gel û civakê. Yek ji pîvanên têkoşînê ya xeta seyemîn ew e ku ti carî nabin amûrê planên hêzên derve. Herwiha armanca xeta seyemîn ew e bi xweseriya pêkhateyan, azadiya hemû gelên bindest pêk were. Di heman demê de stratejiya xeta sêyemîn xwe dispêre hêza gelan, pişta xwe nade hêzên derve. Di xeta sêyemîn de rêz û girîngî ji bo netewe, bawerî û pêkhateyên cihrengiyê heye.

### Rêber Apo mîmarê xeta seyemîn e



Li Rojavayê Kurdistanê dema ku şoreşê dest pê kir, Kurd ne li kêleka rejîma Sûrî ne jî li kêlek dijberên rejîmê sekinîn. Kurdan bi xwe eniyek ava kir û ev jî xeta sêyemîn bû. Mîmarê xeta sêyemîn jî Rêber Apo ye. Rêber Apo pêşengê xeta demokrasî û azadiyê ye. Xeta sêyemîn li Rojava ket pratîkê. Kurd û pêkhateyên bi wan re, li ser hîmê azadî û demokrasiyê tevgeriyan. Dewlet yan jî hêzeke navneteweyî nedan pişta xwe û her tişt bi îradeya xwe kirin. Ev xeta sêyemîn hê jî di Şoreşa Rojava de heye û gel li gorî wê dimeşe.

Lêgerîna gelan a ji bo demokrasî û azadiyê xeta seyemîn e

Rêber Apo ji bo çareseriya aloziya li Rojhilata Navîn di xeta sêyemîn de israr dike. Rêber Apo tîne ziman ku Rojhilata Navîn di nava agir de ye û çareseriya wê jî xwe dispêre hêza gelan û têkoşîna wan a xeta sêyemîn. Rêber Apo ji sala 2004'an ve di nivîs û hevdîtinan de, li ser xeta sêyemîn nirxandinan dike. Ew dibêje, "Xeta sêyemîn xwe disipêre lêgerîna gelan a ji bo demokrasî û azadiyê. Her wiha di bingeha xeta sêyemîn de civak heye. Ev xet serbixwe ye, azadî û demokrasiyê dihewîne û sînoran bingeh nagire.

### Xeta seyemîn polîtîkeyên dagirkeran a parçekirinê têk dibe

Rêber Apo tîne ziman ku xeta sêyemîn çareseriyeke demokratîk tîne. Ev yek dibe ku komar, welat yan jî civakeke demokratîk be. Di xeta sêyemîn de jî hêza Kurdan diyarker e. Ji ber ku ev hêz projeyeke peymana demokrasiyê ye. Û polîtîkaya dagirkeran a parçekirinê têk dibe, gelan dike yek û wan tîne cem hev. Ev projeya li dijî kapîtalîst û mêhtingeran alternatîfek e. Rêber Apo dibêje, ji ber vê yekê ew îro bûye hedef li Îmraliyê û pergala işkence û qirkirinê li ser tê meşandin.

### Hêzên dagirker û navneteweyî Rojhilata Navîn veguherandin gola xwînê




Ji ber Rêber Apo gelek salan li Rojava û Sûriyê ma. Rewşa li Rojhilata Navîn ji nêz ve şopand. Çawa ku Amerîka di sala 2003'an de ket Iraqê wê demê şerê sêyemîn ê cîhanê dest pê kir. Rêber Apo di nirxandinên xwe de jî qala wan rojan dike û dibêje "Piştî wê rojê hêzên navneteweyî dest li Rojhilata Navîn werdan. Hêzên dagirker û navneteweyî bi vî şerî re Rojhilata Navîn veguherandin gola xwînê. Li Iraq, Sûrî, Efxanistan, Libnan, Pakîstan, Tirkiye, Yemen, Somalî, Misir û Lîbyayê encamên giran çêbûn.

Bi milyonan kesî jiyana xwe ji dest da û ewqas jî koçber bûn. Jiyana berê ya li wan welatan êdî ne wekî ya berê ye. Rêber Apo jî li dijî vî şerî projeya xeta sêyemîn derxist pêş. Ev xet jî dawî li wê parçebûn û qutbûnê tîne. Mînaka wê jî îro li Rojava heye. Kurd, Ereb û pêkhateyên li wê derê di nava jiyaneke hevpar de ne. Ev yek jî li hesabê hêzên navneteweyî û dagirkeran nayê. Lewma jî li dijî vê jiyana hevbeş, gelek êriş çêbûn. Emerîka û Rûsya ji bo ku şoreşa Rojava li gorî xwe şîrove bikin gelek lîstik kirin. Mesela, Rûsya ji bo ku Efrînê pêşkêşî Dewleta Tirk bike fuzeyên S-400 firotin wan. Bi vî rengî polîtîkayeke şantajê li dijî rêveberiya Rojava meşandin. Êrişa li dijî Girê Spî û Serêkaniyê jî di encama hevkariya Erdogan û Trump de pêk hat. Ev polîtîka hê jî dewam dike. Ji bo ku Kurd dev ji xeta sêyemîn berdin, her rê û rêbazê bi kar tanîn. Erê rast e, berdêlên giran hatin dayîn, bajarên Kurdan hatin dagirkirin, lê dîsa jî Kurdan dev ji xeta xwe ya sêyemîn berneda.

### Siyaset û riya Kurdan zelal e û ew jî xeta sêyemîn e

Îro jî rayedarên Dewleta Tirk li pey fen û fûta ne. Ji bo ku karibe êrişek din bike hin bazaran dike. Armanc jî Kurd in. Dewleta Tirk di berdêla şerê li dijî Kurdan de, amade ye dest ji gelek tiştên xwe berde. Lê siyaset û riya Kurdan zelal e û ew jî xeta sêyemîn e.

**FENER**



## Erdogan Li NY xweliyê direşîne sûcên xwe û Îsraîlê rewa dike!

**Idrîs Henan**

Di axaftina serokê dewleta faşîst a Tirkiyê de Receb Tayîb Erdogan a di civata giştî ya Neteweyên Yekbûyî de behsa avakirina hevgirtineke mirovî li dijî toreya kuştin û qetilkirinê ya serokwezîrê Îsraîlê Nitinyaho li Filistîn û Lubnanê dike, kir. Erdogan digot; Çawa ku Hîtler berî 70 salan ji aliyê hevgirtineke mirovî hate rawestandin, îro jî divê Nitinyaho û toreya wî ya kuştinê bi koalisyoneke mirovî werin sekinandin! Erdogan di gotara xwe de weke kesekî "aşîtîhez" xwe pêşkêşî civata NY kir û bi awayekî ji xwe bawer, çawa ku ne qatilek û sûcdarekî şer be, ji civata NY dixwaze hêzekê ji bo sepandina aşîtiyê ava bikin!

Ew pîskopatê Rojhilata Navîn wisa xwe daye bawerkirin ku ti kes wî û sîstema wî ya faşîst nasnake. Texmîn dike hemû bedena wî di bin axê de veşartiye, lê nizane ku êdî paşiya wî li ber tavê qijiliye.

Ji êrişên li ser têkoşîna demokrasiya li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê, Herêmên Parastina Medya û heya Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê were. Ji Qibris, Yonanistan, Behra Spî, Ewrûpa û heyanî Afrîqya, Asyaya Navîn û Belqanan biçe, ew kesayeta dirû û sîstema wî ya îşkencê û qirkirinê, li tevayiya wan deveran li pey kuştin, talanî û pêşbirka qirkirina bi Israîlê re ye. Îro jî li ber civaka navneteweyî diçêre û hewl dide qirkirina Kurd û gelên herêmê binixumîne û komkujiyên xwe rewa bike!

Bê goman îroj di kesayeta şerê li herêmê diqewime û çarçoveya wê ya ku roj bi roj berfiretir dibe de, misyoneriya hêzan li gorî nexşerêya têye nîgarkirin, zelaltir dibe. Senyala wê yekê, ango parvekirina rolan, bi pêkanîna komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Apo re dest pê kir. Belê; bi derbasbûna salan û zelalbûna paşperdeya komployê re, rola her aliyekî belî bû. Yek ji bandortirîn rolên di wê komployê de, ya istixbarata Îsraîlê û Nitinyaho bi xwe bû. Ya ku niha em bersiva wê bidin ew e; çima Îsraîl ew daxwaza Tirkiyê ya revandina Rêber APO qebûl kir? Em tenê qala stratejiya wê bikin têrê dike ku mirov axaftinên Erdogan baş fêm bike.

Ji ber pêwîstiya lezgîn ya Îsraîlê ku têkîliyên bihêz û rasterast ên xizmetî stratejiya wê dikin bi Tirkiyê re ava bike û dîplomasiya wê li herêmê pêş bixe û rewatiyê dide kiryarên wê, hişt ku serokwezîrê wê demê Nitinyaho guh bide "Ecewîd" û derhal perspektîf bide serokê istixbaratê "Ebrayim Halîfî", ku bide pey şopa Rêber Ocalan. Bedêl jî çi dibe bila bibe.

Mirov dema naveroka organîk a vê dualîteya Îsraîl – Tirkiyê analîze bike, tê digihêje cewherê rasteqîn a naveroka berjewendiyên herdu aliyan. Di cewherê wê têkîliyê de, koletiya Tirkiyê ji sîstema global re, li qada Rojhilata Navîn, Asyaya navîn, Afrîqiya û Belqanan gihaye lûtkeyê. Ji xwe tenê hevkariya komployê dikare rola stratrejîk a Tirkiyê di avabûn û hebûna Îsraîlê de baş rave bike ka xwedî çi têkîliya çarenûsî ne? Bê guman hemû rûdan û reftar jî bi fermana hegemoniyê û di bin venirîna wê de pêk hatine.

Lew re jî çi şerê ku îro li herêmê bi serpereştiya Îsraîl û Tirkiyê diqewime, di wê çarçoveya stratejîk a yekparebûna konsepta qirkirin û kuştinê de pêk tê.

Tu cudahiyek navbera pratîka herduyan de nîne. Kî li kuderê eniyên şer veke, dixwaze li dijî gelên Filistîn û Lubnanê be, dixwaze li dijî Kurdan û pêkhateyên din be, derhal kopriyên hewayî ji depo û bargehên DYE, NATO yên li Qatar, Tirkiyê û gelek deverên dîtir ava dibin û teze teze teknîka pêşketî digihêjin ber destên wan. Bi gotinek din; çi gotinên Erdogan, li kuderê dibe bila bibe, hebin, hevkarî û piştgiriya nepenî ji Îsraîlê re ne. Gotegotên wî yên li ber civata NY jî, hîkaye, xweliya li çavan, veşartina kiryaran û sûc rewakirin e.